# ROJA NÛ

*kovara huneri çandi û edebi*




40

1994

## NAVEROK

Şeva çanda kurdi lı Danimarkayê - *Serhat Zozan* .......... 3
Cıvina biranina Cigerxwi, Qanatê Kurdo û Yılmaz Guney .......... 4
Şıêr - *Kemal Burkay* .......... 6
Feqiyê Teyra û Ava mezın - *A. Gernas* .......... 8
Gotınên pêşiya - *Salıh Omeri* .......... 11
Heci Rovi - *Mıhemedê Cemilê Seyda* .......... 13
Asimilasyon û rewşa zımanê kurdi/2 - *Haluk Öztürk* ..... 16
Ahmed Arif - *A. Gernas* .......... 23
Çend gotınên bıjarte - *Xalıt Lezgin* .......... 27
Fabl - *Azad Nûbar* .......... 28
Jı nav weşanên nû .......... 30

هەواڵنامەی کتێب

Sal: 16
Hejmar: 83, Mıjdar 1994

ISSN 0283-5355

**XWEDÎ:** KOMKAR-Swêd
**BERPIRSÎYAR:** Şêroyê BOTAN
**NAVNÎŞAN:** Gustavslundsv.168,1 tr
161 36 STOCKHOLM
**TELEFON :** 08/ 26 23 75
**HESAP NO:** PG. 458980 - 0

**UTGIVARE:** Svensk Kurdiska Arbetarföreningen
**ANSVARIG UTGIVARE:** Ş.BOTAN
**ADRESS:** Gustavslundv. 168, 1 tr.
161 36 STOCKHOLM
**FAX:** 08/ 25 38 57
**PG:** 458980 - 0

# Şeva çanda kurdi lı Danimarkayê



KOMKAR - Danimarka, jı sala 1986'an vırde hersal dı meheke payizê de bı navê *"Şeva Çanda Kurdi"* cıvinekê amade dıke.

Îsal ji ev şev dı 5.11.1994'an de hat çêkırın. Beriya şevê heval û hogırên KOMKAR-Danimarka xebateke baş û bı serfırazi meşandın. Nêziki 1200 kesi beşdari cıvinê bûbûn. Dı şevê de bernameke dewlemend hat pêşkêşkırın. Zılm û zordestiya lı ser gelê kurd, berxwedan û têkoşina gelê me dı nav sala 1994'an de, wek senaryo, bı tevi belge û wesiqan wek filmeki video hatıbûn amadekırın. Film, lı sehnê dı ekraneke 4 mitroyi de jı beşdaran re hat pêşkêşkırın. Ev senaryo û filma video gelek bala mêvanan kişand. Senaryo bı zımanê kurdi, danimarki û tırki hat pêşkêşkırın.

Dı beşa çandi de, dı seri de hozanê gelê kurd yê bı nav û deng Şıvan Perwer, û Brader, Seydo û Koma Karwan bı stranên gelêri û welatperweri carna mêvan xıstın nav kul û xeman, carna ew rakırın ser piyan û lı dıji dagırkeran kûla dılê wan rıjandın carna ji bı sedan kes rakırın dilanê, mıl dı mılda govenda kurdan kışandın.

Du Komên folklor yên KOMKARÊ -ya mezınan û ya zarokan- dı nav kıncên rengin da govendên kurdi yên cure cure pêşkêşi beşdarên şevê kırın. Ev şev her weha jı aliyê pıştgıriyê da ji şeveke geleki dewlemend bû.

Serokwezirê Danimarkayê Poul Nyrup Rasmussen, Wezirê Hundır Birte Weis, Parlamenterê Sosyaldemokratan Henning Gjellerod, Parlamenterê Partiya Venstra (Partiya Çep) Knud Enggaard, Hanne Severinsen, Niels Henrik Nielsen, Ole M. Rasmussen jı şeva KOMKAR'ê re mesajên pışt-gıriyê şandıbûn.


Her wusa dı şevê da, bı navê Partiya Sosyalist a Gel (SF) parlamenterê kevn Pelle Voigt û parlamentereke vê partiyê ya nıha Annette Nördström Hansen, bı navê Sosyaldemokratan serokê sendiqa HK Jimmy Hansen û bı navê Partiya Radikal Venstra (Radikalên Çep) Grete Bille axıfin.


Şev bı sırûda Ey Raqib û bı serfırazi xelas bû.


**Sarhad Zozan**
Kopenhagen

Cıvineke mezın jı bo biranina sê hostayên çanda kurdi:

# Cigerxwin, Qanatê Kurdo û Yılmaz Guney







KOMKAR`ê dı panzdê Cotmehê da, lı bajarê Koln`ê bi navê "Çanda kurdi ya zindi" cıvineke mezın amadekır. Cıvin jı bo biranina sê emekdarên çanda kurdi; Seyda Cigerxwin, Prof. Qanatê Kurdo û Yılmaz Guney hatıbû amadekırın.

Lı dor heft hezar kurd dı cıvinê da hazır bûn. Her usa gelek şexsiyetên naskıri yên kurd û biyani beşdari şevê bûbûn. Wezirê hundır yê Eyaleta Vestfalya Bakurê Renê Herbert Schnoor, Sekreterê Gıştî yê Partiya Sosyalist a Kurdıstanê (PSK) Kemal Burkay, Serokê Komela Mafên Mırovi Akın Birdal, nıviskar Vedat Türkali, Serokê Enstituya Kurdi ya Parisê Kendal Nezan, hunermendê sinemayê Halil Ergün, parlamenterê Partiya Keskan



Sigi Martsch, lêkolinevan-nıviskar Mehmet Bayrak, nıviskar Ömer Polat, kurê Cigerxwin Kesra Cigerxwin dı cıvinê da yek gotar xwendın. Hunermendê sinema û tiyatroyê Renan Demirkan ji çend helbestên Cigerxwin bı zımanê almani pêşkêş kır û pıştgıriya xwe da xuyakırın. Parlamenterê serbıxwe yê Erzuromê Abdulmelik Fırat ku dıxwest beşdari cıvinê bıbe, jı aliyê polêsên Tırk va lı balafırxanê hatıbû sekınandın. Polêsê tırk jı bo derketına wi destûr neda.

Disa gelek siyasetvanên naskıri yên alman jı şevê ra mesajên pıştgıriyê şandın. Wek serokwezir, wezirên eyaletên cuda û serokên belediyan. Herwısa gelek rêxıstınên kurdan ji slavnameyên xwe yên pıştgıriyê gihandın cıvinê.

Bernama cıvinê bı axaftına serokê KOMKAR'ê Mehmet Şahin dest pê kır. Şahin dı axaftına xwe da bı kurti behsa sê rûmetên çanda kurdi kır û bı wê ra j gırêdayi behsa şerê qılêr yê ku dewleta Tırk lı Kurdıstanê dıdomine kır û dı vê demê da berpırsiyariya ronakbirên Tırk û Kurd ani zıman.

Dı bernama çandi ya şevê da ji, hozan Şıvan Perwer, Emekçi, Yılmaz Çelik, Nilüfer Akbal, Koroya Nûdem, Tiyatroya Botan û koma govendê ya Koln-cıwan beşdar bûn.

Xên jı bernama ku lı ser sehnê dıhat pêşkêşkırın, lı koşeki sehnê ji derheqa jiyan û xebata Cigerxwin, Qanatê Kurdo û Yılmaz Güney da lı ser ekraneke mezın didemên videoyê dıhatın nişandan.

Ev cıvina mezın bı awaki rêk û pêk hatıbû amade kırın û meşandın. Beşdarên cıvinê dılxweşi û razibûna xwe diyar dıkırın. Wan careke dın rûmeteke mezın dıdan xebata xwedilêderketın û parastına çanda kurdi. Bı vi awayi jı zehmetkêşên çanda me ya bındest 3 hostayên birewer dı salvegera mırına xwe da hatın biranin. Cıvin bı serfırazi kuta bû û gıhişte armanca xwe. □

# *MEŞKA KURDAN*

*Dengê meşkê nerm e*
*Jı loriya dê*
*Dengê meşkê nerm e*
*Jı kılameke xemgin*

*Lê meşka Kurdan*
*Deh qat xemgin e*
*Dı têlên dıl da dılerze*
*Rojên koçeriyê tine biran*
*Çirokên evindaran*
*Ku tım bê mırad mane*
*Zulmê, berxwedanê û çiyan*
*Û mêrxasên şıkesti*

*Meşka Kurdan*
*Weki jı sedsalan nısıliye*
*Hunguvê êş û jan e*

*Kemal Burkay*

# DENGBÊJ

*Dengbêji jı dıl e*
*Dılê dengbêj dıkele*
*Dengbêj bayê bêriyên welatê mın e*
*Berhemê zozanên rengin e, gul e*
*Kılamên wi dengê sımên hespên sor ın*
*Ava belekiyan e, bı şırin e*
*Geh çemeki din e, dıxulxule, bı qirin e*
*Geh gıran dıkışe, dılorine*
*Lı dengê wi geh şer e, geh aşti ye*
*Şayê dilanan e, giriya şin e*
*Dengê wi jana bırinan*
*Tama biraninan*
*Germiya evin e*
*Berxwedan e, hısret e, hêvi ye*
*Dengê wi zmanê me yê şirin*
*Çiroka Kurdan e, jin e*

*Kemal Burkay*

# Feqiyê Teyra û Ava Mezin

Berhevkar: A. GERNAS

Feqiyê Teyra jı ba Mirê Botan radıbe û berê xwe dıde ava mezın. Dıgıhije raseri Geliyê Qesrıkê û jı wê derê lı Ava Mezın dıxe. Evinek pê gırtıye, muhba Xwedê lı dılê wi daye û bı wê dılxweşiyê qeside davêje ser avê. Ava Mezın ji, dıxulxule, xuşinek pê ketıye ku dengê wi dıçe lı Çiyayê Şıngalê dısekıne. Dema ku Feqi lı avê dıxe, av jê dıpırse: "Tu jı ku têyi, tê bı ku va heri? Derdê te çı ye, armanca te çı ye? Ev çı mırmıre jı nava te tê, tu nahêli mıllet razê?..

Feqi lı avê dıxe. Av davêje kabokê û Feqi bı qeside dest bı pırsê xwe dıke:

Ey av û av, av û ey av û av
Ma tu bı eşq û muhbetê
Mewc û pêla davêji bı lav
Bê sekne û bê rehetê

Bê reheti bê sekne yi
Yan aşıqê baxê xwe yi
Yan Şubhetê qelbê me yi
Jı eşqa kes natebıtê

Jı eşqa kê têy û têy
Heta kengê tê bêy û bêy
Jı bo mın bêje heyrana te bım
Tu jı kê ra dıki vê taetê

Tu jı kê ra dıki zıkrê bı hal
Qet gujguj û mırmırê tu naki betal
Dı şubhetê ev meh wısa
Lê şev û roja lı te xew netê

Şev û roja tu bê xewi
Jı ber eziyeta kê dıtewi
Çı sebeb e tu nahewi
Lê şev û roja tu lı dawetê

Şev û roja dawet dıki
Ku kete çılê zıvıstanê tu qetlê dıki
Ma ne zulm e tu vê dıki
Qey tu natırsi jı rebê Izzetê

Şev û roja tu bê xewi
Jı ber muhbeta kê dıtewi
Şev tari ye lê tu qet nahewi
Daim dıçi dengê te tê

Dengê te tê bê pi û hav
Lê tu taet dıki bê qelb û dav
Peyda dıbın jı te mewcıkê av
Subhan jı navê qudretê

Gehgeh sıpi şubhetê şir
Qet mıslê te ninın tu tê

Dengê te tê yar nebi
Lê meyla hebib jı çûna netê

Tu bersivek jı avê nayê, Feqi acız dıbe û weha dıbêje: "Hebe tunebe muhbeke te heye, yan dosteke te yan ji daxwaziyeke te, lewma tu weha bê edebi, tazi yi, heya te nine... Nexwe te nıha cewabeki dabû mın" û pırsên xwe bı qeside dıdomine:

Lazım te mehbûbek heye
Yan dost û metlûbek heye
Yan meyl û mensûbek heye
Lew tu tazi yi bê keswetê

Lew tu bê libas û tazi yi
Tu bı reqs û seyr û gazi yi
Tu jı kê ra dıki şehbaziyê
Geryam dı behra xurbetê

Geryam dı ber mahra dınê
Tu qet nahewi û tu nahedınê
Tu wek şubhetê qelbê mınê
Bı dest dıkşini muhbetê

Zehmetpırê muhbet geşê
Lê lı te nazıkê teb'et xweşê
Bê ruh lı erdê dımeşê
Bê dest û pê tu jı ku va tê, tê bı ku va dıçê.

Bê dest û pê, bê çeng û per
Ev pêl û mewc û fetl û ger
Tu jı kê ra dıki ev gêr û xedr
Tu naki beyana illetê

Vê illetê beyan bıke
Bes vi şeri lı mın star bıke
Carek lı mın ızhar bıke
Da ez bızanım heyetê

Da ez bızanım vi sıri
Tu jı hındıki têyi yan jı pıri
Jı maneya vê gırgırê
Tu jı kê ra dıki vê taetê

Yan ez bızanım meselê
Lê cuzwek jı behsa ewelê
Jı dınyak bûne menzelê
Jı dewra nûçerxa adetê

Bê darê dınya ser temi
Tu eva rebê alemê
Tu hadısi yan qedemi
Yan tu nızani tıştekê

Av bersiva Feqi dıde:

Ez ava rebê zurcelal
Bori lı mın çend meh û sal
Qet kes nekır jı mın ev sual
Heta gıham vê saetê

Heta gıhame vê demê
Ma yeki wek te nebû dı pışta ademi
Ma kes nebû dı vê alemê
Bı pırsê halê vê şetê

Xelkê Xwedê aqıl kıri
Hım arıf û kamıl kıri
Nûrek dı dıl da hıl kıri
Eslê qısê wê bı ser me tê

Avê got, "Feqe! Musulmanê Feqi, ne ulmê te heye, ne wextê te heye. Tu weke dinek i, weke heywaneki, ka bêje bı çı aqıli tu jı xelkê van pırsan dıki. Ma haşa tu jı wan enbiya, wan weliya mezıntır i. Jı bavê Adem heta bıgıhê te sêsed û bist û çar pêxember rabûne. Ma qey tu jı ewqas kes mezıntır i ku, kesi van pırsan jı mın nekır tu dıki... "
Avê got:

Êy Feqiyê muslimê ulm û ax
Tu mecnûn û heywan û sıfax
Bê tevtêşi pırsa dıki
Bê rohni neke babetê

Pırsa Feqe bı cih nebû
Lewra dı quranê hebû
Feqe got :

Erşê Xwedê lı ser te bû
Avê gelo dı bira te tê

Avê cewab da ersexin
Zeman nebû hal û kewne mın
Remzek padişahê mezın
Subhan jı vi seltenetê

Subhan jı mabûdi lı ser
Kê jı Xwedê ra bır xeber
Em çare kın anine der
Gênc bûn dı kenza qudretê

Feqe got :

İro werın, lazım werın
Lê ciran û xelkê hışetê
Hûn rayekê lı mın bıkın
Lê iro qewi gıriyê mın tê

Avê got :

İro jı mın qewi gıri
Lê sosın lı mêrga xeyıdi
Sed heyf e wan lêvên şekıri
Êdi venaxwın şerbetê

Ew lêvên lal ên şekır
Jı wan kêm dıbû dewr û xebat
Sed ax û kovan û keser
Heyf eyn û lam çûn hicretê

Heyf eyn û lam jêk bûn cuda
Lê hızn û gıri disa te da
Ez razi me bı emrê Xweda
Herçi jı dergahê te tê

Feqe got :

Herçi dıke ew mir dıke
Lê xêr û şera teqdir dıke
Daxa lı qelbê mın pir dıke
Lê sotın bı narê fırqetê

Sotın bı pêta agıri
Vê faniyê em hûr kıri
Lê kulek dı dıl da çêkıri
Êy felekê bê murwetê

Kani dızên, co jê dıçın
Lê hındi Xwedê dan ıns û cın
Avê got :
Qet kes nekır ev pırs jı mın
Jı nav embiyayê ummetê

Ava Mezın bala Feqe dıkşine, da ku dev jı van pırs û sualan berde, lê Feqe guh nade avê û wê bêmınet dıke :

Avê, ew nebi bûn ez Feqe me
Ew bı aqıl bûn, ez serseriyek bı şubhe me
Ez muhtacê pırsa te me
Lê bes lı mın bıke vê şiretê

Ava mezın bes qır qır meke
Zıkrê Xwedê bıke, fexrê meke
Tu ehlê Xwedê acız meke
Bes mın bıde vê eziyetê

Ava Mezın xwe bı xwe : "Ez jê ra çı dıbêjım, bêfeyde ye. Evya aqıl nagre. De ka bısekıne ku ez çı binım serê te!.."

Ava Mezın lı hev şêwıri
Pêla pêşi jı Feqe enıri
Dev dev lı Feqe zıvıri
De em bavêjın diyarê zulmetê

Gava Feqe xwe têk dıda
Lê pêla pêşi xwe lı stû dıda
Feqe gırt û bır û lı gêrê dıda
Got, here bımre lı vê hesretê

Ava Mezın lı Feqe tê xezebê û wi davêje nava gerinekêki. Gerinek wi dı nava xwe da dıbe û tine, serav û bınav dıke.. Av dıçe devê Feqe û dıkeve tengasiyeke mezın.

*Dumahik heye*

# Gotinên Pêşiya

BERHEVKAR: SALİH OMERİ

Bo xatırê xatıra, merıv dıkeve bın barê qantıra.

Nok bû fırik, mele bû şırik.

Kutana nav kayê, cıxara ber bayê, tu tema wê tune.

Dê bû damari, bav bû fılê kavari.

Gotına me lı mala me.

Gırara te lı gabûra te.

Kor korê Xwedê ne, nivkor bela serê dınê ne.

Bıla lı erş be ne lı bın ferş be.

Du bıra neçın du gıra.

Qala gur kın, dar hazır kın.

Ku vır be, bıla pır be.

Kumê rastiyê xwar e.

Bûk anin bı lez û bez, sıvıka malê disa ez.

Mal bû bı dudiya, dew ma lı sêpiya.

Dev û dest bûn heval, kar ma betal.

Xweli lı wi seri , ku sed seri jê ne qeheri.

Dew dıklêm dew nabe, rûn lı meşkê belav be.

Gur jı baranê bı tırsya, wê jı xwe re kurkek çêkırna.

Rım dı çewal de nayê veşartın.

Bûk bı dılê zavê ye, çı kula dılê xelkêye.

Bêhna diya, tê jı xalti ya.

Kalo nemır bıhar tê, pirê nemır pıncar tê.

Heger ev ne fen e, ev çı ben e?

Dızê bistana, lı xwe mukur tê zıvıstana.

Ku mero dız be, şevê reş pır ın.

Mala gur e, ne dahn e ne burxur e.

Jı kul û derda, mı rih ber da.

Ê ne lı malıkê, nızane bı hewalıkê.

A dıla nayê mıla.

Kargerê xwe, şêrinê xelkê.

Wextê tu bı mali, tu bı ap û xali.

Dıza jı dıza dızi, erd û ezman lerızi.

Mêvan jı mêvan nexweş e, mazûban jı herduyan nexweş e.

Şev reş e, dız hezar, ki zane kê qayişa te xwar.

Seriki kara bı bist û çara.

Çelê Ereba fırikê noka.

Zıkê dê buxçık e.

Bı xweziya, dest naghêje baqê keziya.

Ne Koçerê bê pez, ne gundiyê bê rez, û ne ji mêrê bê ez.

Sê kesên bêhış hene lı dınyê, ê lı kaşa vexwe qelûnê, ê rêbara here bı tenê, û ê ku mala xwe çêke lı ba mala bavê jınê.

Cıvat xweş e bı sê tışta: ya bı sotın, ya bı gotın, yan ji kotın (hesti).

Ya bı ser bı ser, ya zêr lı ser, û ya xweli lı ser.

Lı gor salê tê fesalê.

Destê rehet lı ser zıkê bırçi ye.

Ev hevir gelek avê dıxwaze.

Xwediyê keriya çû devê deriya, go ka pıçık rûnê seriya.

Parsek e bı şûr û qetek e.

Destê tenê lı çepıkan naxe.

Gundê mezın jı rê ve xuya ye.

Pariki xweş, hêja ye gaki reş.

Nan nerm e û zıke çerm e.

Çıqas sıngeki dıkutım, hebaneki pê dadıkın.

Serê keçel dı bın kum de baş e.

Ê ne jı makê, nabe jı mêlakê.

Mı xwedi kır bı guhana, wê jı mın sıtend bı nav rehna.

Kesê nekes nabe kes, kurtanê kerê nabe etles, jı zana re gotınek bes.

# Heci Rovi

Mıhemedê Cemilê Seyda

*(Çirok jı ali Serhat ZOZAN va jı ber kasetê hatiye wergırtın)*

Rojek rovi bırçi bû
Rasti gurek wehşi bû
Jı nışkave rahışte wi
Turık kıre serê wi
Rovi got de mın bıxwe
Da bıgıhêm mıradê xwe
Dest pêkır keni
Zûka mın bıxwe ezbeni
Jı bo ku pır gunehkar ım
Êdi hew ez dıkarım
Gur jê gelek eceb ma
Jı ber kenê wi mat ma
Wi got eger mın te xwar
Nahêlım lı te bıbe êvar
Çawan dıghi mıradê xwe
Rovi got bı serê te
Dı jiyana xwe de
Bê emritiya Xweda
Geleki mın kıriye
Lê mın tobe kıriye
Dıvê ez herıme hecê
Da ku toba mın bête cih
seyda bo mın gotiye.
Yê ku hec lê ketiye
Lı ku, ku bımre
Heca wi qebil dıbe.
Gur rovi berda
Rovi pesnê Xwedê da
Wi ji xwe kır tobedar
Rovi berda û nexwar
Qederek meşiyan
Çend gavên dın avêtın
Rastê kereki hatın
Kerê got:
Ha bırakno, we xêre
hûnê kuda herın
Ew ji bu hevalê wan
Hersê bı hevra bûne hecvan

Du roj, sê roj meşiyan
Gur û rovi westiyan
Dınya, dem buhare
ker dıxwar giha û dene
Rovi gote kerê nêr
Mal xırabo tu bınêr
Gur, çawan tobedar e
Êdi nêzda nıkare
hersê lı hev rûnıştın
Salê xwe jı bo hev gotın.
Yê ku bû pıçûkê me
Ew bû fedekarê me
Gur got:
Roviyê jir
iro tu bıbe kızir
Rovi got:
Cihê ku tu lı wır bi
Ev tışt jı bo mın nabi
Gur got; ez qet nızanım
Madem ku ez hakım ım
Diya mın dıgote mın
Dema tu çêbûy jı mın
Midyat hin nu avabû
Xwedê ew çax te dabû.
Rovi dest bı gıriyê kır.
Rıjand bı çengan hıstêr
Te agır berda dılê mın
da ser herdu kurê mın
Dema Midyat nu avabû
Du zarokên mın bûbûn xort
Herdu mırın bı hevra cot.
Gur got :Kerê nêr
Ka salê xwe tu bijmêr
Kerê got:
Ez nızanım salê xwe
Lê ezê bêjım jı we re
Roja ez çêbûm jı dayê
ez avêtım dınyayê
Gotıbûn lı ser sola te
nıvisiye tarixa te.
Gur got: Roviyê jir
Rabe bıxwine kızir
Bıxwine tarixa wi
Ka çıqas ın salê wi

Rovi got:
Jı gıriyê ez kor bûme
Hıngi ez pis bûme
Nıkarım ez bıxwinım
êdi ez hew dıbinım.
Gur got:
Ez pır xwendevan ım
Bı erebi dızanım
Êdi ew ber bı wi çû
Rovi gote; kerê çoo!
Kerê lıngê xwe hılda
Pihnê lı nav çava da.
Gur lı erdê çınqızi
Mêji seri tenqızi
Dema gurê şin mıri
Rovi lı ser wi gıri
Kerê got malxırabo
Êdi nızanım çawan bû
Ne dızanım şina te
Ne ji bı şahiya te
Jı ber fendê we roviya
Kesek nema lı çiya.
Rovi got:
Toba wi tê bira mın
Jê re pır tê gıriyê
Dıgo ez bûme heci
Da toba mın bête cih
Gotına wi tê bira mın
Her wek pertê kerê mın
Dıgo pır xwendevan ım
Bı erebi dızanım.
Geli xortê Kurmancan
Hûn bıxwinın kovaran
Da ku hûn zana bın
Hûn hışyar û ronak bın
Bı xwendın û zanin
Himê Kurdistan tê danin.

ASİMİLASYON,

ZIMANGUHASTIN - ZIMANPARASTIN

# Û REWŞA ZIMANÊ KURDİ-2

(Bı awıreki kurt)

Haluk Öztürk

Gelek caran tenê bı zımanguhastınê, kesek yan ji cıvatek asimilebûyi nayê hısabkırın. Qet nebe temamen asimilekıri nayê hısabkırın. Çımki asimilasyon, guhastına huviyetê ya temami ye. Ew ancax pıştì zemaneki dırêj û gelek prosesên cuda dıkare pêk bê. Lê dıvê neyê jı bir kırın, ku dı huviyet-guhastınê da gava pêşin û bıngehin guhastına zıman e. Loma jı bo siyaseta asimilasyonê, hedefa ewıl kuştına zıman e.

Bı gotınek dın, guhastına zıman "A" yê Asimilasyonê ye. Loma ew faktorên ku dı zımanguhastın-zımanparastınê da rol dıleyizın jı bo guhastın yan ji parastına huviyetê ji derbas dıbın (Dı beşê yekemin yê nıvisê da, me bı kurti qala van faktoran kırıbû). Lê bı mahiyeta xwe va pırsa asimilasyonê pırseke firetır e. Mıxabın em nıkarın lı vêderê, dı çend rûpelan da pırseke weha fire û gırıng, jı her ali va şırove bıkın. Lê qet nebe jı bo balkışandına ser gırıngiya pırsê, û xasma ji pırsa zıman, me pêwist dit ku em hın nêrinên xwe lı vêderê binın zıman.

## Çıma pêşiyê zıman?

Zıman dıkare dı hebûna mıleteki da rola heri mezın bıleyize. Loma siyaseta asimilasyonê wê helbet pêşiyê lı kuştına zıman bıgere. Ew ê çı bıke? Wê zıman qedexe bıke, bêrûmet nişan bıde; rê lı ber pêşketına wi bıgre; şertên jiyanê jê bıstine heta ku dı dawiyê da bıkuje. Em dıbinın ku dewleta tırk (TC) ji heta nuha jı bo vê yekê hewl daye û dıde.

Beri ku em behsa siyaseta asimilasyona TC bıkın, em dıxwazın derheqa gırıngiya zıman da, bı kurti cih bıdın ditınên çend ronakbir û zanayên kurd û biyani. Em wısa hêvi dıkın ku ev raman û ditınên han wê bıkarıbın bêtır xwendevanan bıdın fıkrandın lı ser gırıngiya zıman û çanda kurdi.

*" Eger insanek bı zordayinê dev jı zımanê xwe berde, maneya jiyana*

*xwe wında dıke. Xelkek xwedi rıheki genetik e, û ev rıh heri baş bı riya zıman tê jiyandın"*

Andres SÜTÖ

(Nıviskareki Romanyayê, jı hêla Transilvanyayê ye)

*"Eger zımanê kurdi û çanda kurdi bête kuştın, hebûna kurda ji lı holê namine û ev hebûn nayê vejiyandın. Jiyana kurdi maneya xwe wında dıke û rıhê gelê Kurd dımre. Û xelkeki bê rıh jı bo azadiya xwe şer nake. Jı ber ku tıştekî tu jı bo wi şer bıki tune. Jı ber vê yekê ye ku, ew siyaseta zıman û kulturê ya ku dıxwaze zıman û kultura kurdan bıkuje, gelek efektiv e."*

T.S. KANGAS

*"... Ku dıjmın zman û çanda me qedexe kıriye, dıxwaze gelê me bı aliyê moral bê çek bıhêle, dıvê em zêtır guh bıdıne karên çandi. Karê çandi jı bo me çekek e dı şerê rızgari û azadiyê da".*

*"... Dıvê merıv ne karê siyasi, ne ji karê çandi bıçûk bıbine. Ew herdu bı hev ra gırêdayi ne, xasma bo mıleteki, wek me."*

Kemal BURKAY

*Geli kurdan!*

*Eger hûn naxwazın jı hev taromar û wında bıbın, beri her tıştî zımanê xwe bıxwinın, bıdın xwendın.*

*Lê eger dıxwazın xwe nas bıkın û xwe bıdın naskırın û hezkırın, û bı rûmet û serbılındi bıjin, disa zımanê xwe bıxwinın û bıdın xwendın.*

Nuredin ZAZA

*Gelê ku zıman û çanda xwe bıparêze, lı rûmetên xwe yên netewi xwedi derkeve, weki gırtiyê ku kılita zindana wi dı berika wi da be, ew ê zû an dereng bıgıhê azadiya xwe.*

Kendal NEZAN

(Serokê Enstituya Kurdi ya Parisê. Hevpeyvin, Azadi Hej. 47. Nisan 1993)



*"Mıletên bındest heyina xwe jı serdestên xwe bı du tıştan, bı qeweta du çekan dıparêzın. Ol yek. Zıman dudo. Lê heke ola mıletê serdest û bındest yek bıbe, hıngi çek yek bı tenê ye û bend tenê zıman e".*

Celadet BEDIRXAN

## Siyaseta dewleta tırk:
# Jenosid û asimilasyon

Jı bo têgıhiştina rewşa iroyin ya zımanê kurdi, gereke beri her tıştî siyaseta dewleta tırk lı hember zıman û çanda kurdi baş bê naskırın û zanin. Dewletê do çı dıkır û iro çı dıke jı bo ku kurd zımanê xwe jı bira bıkın, û dı şûna wi da tırki qıse bıkın? Pêwist e em hıneki lı ser vê rawestın.

Çawa tê zanin diroka asimilasyonê û zordestiya lı ser zıman û çanda kurdi bı sedsalan kevn e. Lê dı tu dewrê da bı qasi van

70 salên derbasbûyi, tevdirên asimilasyonê yên hışk û sistematik nehatıne xebıtandın. Jı ber ku Komara Tırkiyê (TC) jı roja avabûna xwe heta nuha jı bo tunekırına mıletê kurd planeke mezın daniye ber xwe û dımeşine. Ev plan, bı taybeti bı du metodan tê meşandın:

1. Jenosid (qırkırın, surgun û belavkırın)
2. Helandın (asimilasyon)

Etnolog-sosyologa İskandinavi Tove Skutnabb Kangas siyaseta dewleta tırk wek tunekırına fiziki û kulturi bı hevra bı nav dıke. Kangas vê yekê weha şırove dıke:

*"Dewletên ku Kurdıstan dagırtıne û dı nav xwe da parvekırıne, ramana "dewleta neteweyi", jı dewletên Rojavayê wergırtıne, ku pışti Şerê Cihanê yê Yekemin qısmen bûne sedemê rewşa iroyin a Kurdıstanê û ev rewş hê ji dom dıke. Lı gor raman û ideolojiya "dewleta neteweyi", dewleteke ideal dewleta neteweyi ye û dı dewleteke neteweyi da tenê neteweyek (mıllet) zımanek û çandek dıkare cih bıgre. Eger nuha dı welat da hın grubên etnik hebın, dıvê vana bêne asimilekırın; na eger ew asimilasyonê napejırinın dıvê ew bı awayeki dın bêne wındakırın da ku neyên xuyan. Wek psikolojik (bı inkariya hebûna wan) yan ji wek fiziki (bı kuştın, jı hev belav kırın û koçemal kırınê). Dewleteke neteweyi, hebûna hûrgelan, zımanê wan û çanda wan lı hember xwe wek zextekê dıbine û his dıke. Jı ber vê yekê ye ku, bı gelek metodên cuda lı qırkırın û wındakırına hûrgelan dıgere.*

*Ez, siyaseta Tırkiyê ya iroyin wek qırkırına gel a zımani û çandi dıbinım, û pêra jı wek qırkırınek fiziki ya gelêri şirove dıkım. Dema ku hejmara Kurdan jı bo kuştına fiziki gelek e, Tırkiye jı ali çandi û zıman va lı kuştına kurda dıgere. Bı kuştıneke fiziki ya gelêri ji holê wında dıbın, qır dıbın; û disa bı qırkırına zımani û çandi ya gelêri kurd wında dıbın, asimile dıbın û dıbın tırk."*

(Tove Skutnabb Kangas, Hevpeyvin, Roja Nû hej. 77 (34), 1992)

Dewleta tırk dewleteke nıjadperest û koloniyalist e. Siyaseta wê ya zıman ji lı gor van karekteran forma xwe gırtiye. Lı gor TC'ê dıvê zımanê kurdi bê jıbirkırın. Dıvê hemû kaniyên kultura kurda bên zuhakırın. Lê tıșteki dın ji heye: çawa ku sosyolog İsmail Bêşikçi ji bı dest nişan dike, kemalizm ne tenê nıjadperesti û kolonyalisti ye; ew her wısa ji politikayeke kulturê ya emperyalist dajo. Sazgehên tırki yên kulturi cehd dıkın ku berhemên folklori yên kurdan bıkın malên tırki. Gelek stran û melodi, govend û çirokên kurdi wek yên tırki tên pêşkêşkırın. Ew jı hêlekê va bo helandın û tunekırına kultura kurdan hewl dıdın, jı aliyê dın va ji wê dıdızın û jı xwe ra dıkın mal. Yani asimilekırın, tunekırın û talankırın bı hevra tên meşandın.

Dewleta tırk, ji bo ku bıkarıbe kurdan bıheline, hemû xusûsiyetên wan yên milli jı ortê hıline, heta nuha gelek rê û metodên cuda bı kar anine. Dı zıncira metod û tevdiran da qedexekırına zımanê kurdi xeleqa pêşin e. Derhal pışti **Peymana Lozanê, dı 1'ê Adarê sala 1924' an** da zımanê kurdi hat qedexekırın . Ev bû destpêka siyaseta asimilasyona TC'ê. Jı vê demê şûnda, behskırına navê kurd û Kurdıstanê bû tabû. Hemû sazgehên netewi, komel, kovar û rojnameyên kurdan hatın qedexekırın

Wek hemû kolonyalistan, serwerên dewleta tırk ji rol û gırıngiya sazgehên netewi; xebata lı ser zıman û kultura gelên bındest ditıne. Jı bo wan, pêşilêgırtına van xebatên han, bêguman pırseke heyati ye. Ev dı rapor û belgeyên dızi yên dewletê da ji geleki vekıri tê xuyakırın. Dı van salên dawin da, jı arşivên dızi gelek belgeyên weha derketın ortê. Jı bo têgıhiştına gırıngiya van xebatan û analizkırına rewşa iroyin, têda gelek feyde heye ku em jı nêzik va bala xwe bıdın ser van belgeyên veşarti yên kevın.

(Mesela bınêrın lı kıtêba Mehmet Bayrak, ya bı navê "Açık-gizli, Resmi-Gayriresmi KÜRDOLOJİ BELGELERİ", Özge Yayınları, 1994, Ankara)

Mêze bıkın, Mıstefa Kemal dı cıvinekê da ji endamên Sazgeha Diroka Tırk (Türk Tarih Kurumu) ra weha dıbêje:

***"Me erdê Balkanê çıma wında kır? tenê yek sedemeki vê heye. Ew ji avabûna sazgehên zıman ın, ku jı aliyê sazgehên lêkolinê yên Slavi hatıne sazkırın. Û dema wan tarixa kesên dı nav me da nıvisandın***

*û şuûra milli hışiyar kırın, hıngê em jı Balkanan heya sinorê Trakyayê paşda vekışiyan."*

(Enver Behnan Şapolyo, Komcıvina Zıman ya Istisnai ya 1951. Enqere 1954, rûpel 54. Yê ku behs dıke Ismail Beşikçi, Mesaja Ismail Beşikçi jı Komcıvina KOMKAR ra, Roja Nû, hej.64 (21) 1988)

Dewleta tırk lı şiretên M. Kemal baş guhdari kır û dıke...

Çend rê û tevdirên ku dewletê heta nuha jı bo asimilekırına kurdan bı kar aniye, (bı xetên gışti) em dıkarın weha rêz bıkın:

- Red û inkarkırına hebûna gelê kurd û mafên wi yên netewi
- Qedexekırına zıman û çanda kurdi
- Qedexekırına sazgehên netewi
- Xırabkırın û paşdahiştına aboriya Kurdıstanê
- Surgûnkırın, belavkırın û koçemalkırına kurdan
- Bıcihkırına mıhacırên tırk lı Kurdıstanê
- Guhastına kınc û qıyafetên kurdan
- Nızımditına erf-edetên kurdi
- Dızina berhemên folklori yên kurdan
- Qedexekırına navên kurdi
- Guhastına navên gund û bajarên Kurdıstanê
- Herıfandın û veşartına berhemên kurdi yên diroki
- Dı mekteban da fêrkırına zarokên kurd bı zımanê tırki
- Empozekırına başbûn û mezınaya zıman û çanda tırki û nıjadê tırk
- Vekırına xwendıngehên bı nıvin û yên dini lı Kurdıstanê
- Fêrkırına zımanê tırki bı riya medya (sinema, rojname, radyo û TV.)

û hwd...

## İdeolojiya Kemalist heta nuha bı ser neket

Dewleta tırk, bı vê siyaseta nıjadperest û kolonyalist heta nuha negıhiştiye armanca xwe. Çımki gelê kurd bı qetliam û surgûnan xılas nebû; koleti qebûl nekır, pır caran bı serhıldanên mezın lı dıji zordestiya netewi (milli) şerkır. Herçıqas zımanê kurdi, çanda kurdi bırindar bû, rê lı ber pêşketına wê hat gırtın ji, lê wında nebû. Mıletê kurd, iro ji lı ser piyan e, û jı bo azadiya xwe bı camêri ber xwe dıde.

Gelê kurd geleki qedim e, xwediyê kultureke zengin ya bı hezar salan kevn e. Lı aliyê dın nufûsê kurdan pır e. Iro lı Rohılata Navin hejmara wan bı tevayi dıgıhije 30-35 milyonan. Dı navbera 15-20 milyonê wan tenê lı Kurdıstana Bakur û lı Tırkiyê dıjin. Dewletên dagırker, bı qırkırına wan nıkarın serederiyê derxinın. Û iro êdi parçeyeki Kurdıstanê ji azad e. Pêkhatına hukumat û dewleta federe ya **Kurdıstana Başûr** hêvi û morala mıletê kurd bılındtır kıriye. Şertên dınyayê ji êdi wek berê mecalê nade dewletên dagırker ku bı qetliamên mezın pırsa kurdan vemırinın, wê paşda bavêjın. Her ku dıçe pırsa gelê kurd û Kurdıstanê dıbe pırseke navnetewi.

Dıgel vê rastiyê, disa ji dewleta tırk naxwaze dev jı siyaseta xwe ya berê berde. Loma dı rojeva dorhêlên siyasi yên tırk dagelek caran propaganda ser asimilebûna Kurdan, ci dıgre. Nemaze dı van salên dawin da, pıştî "naskırına" realita kurd- lı ser wê munaqaşeyên cuda çêdıbın. Yên ku vê pırsê pêşda tinın û lı ser qısedıkın, dı seri da serwerên dewletê, rojnameyên berdevkê dewletê û hın dorhêlên ronakbir yên tırk ın.

Mesela lı gor Demirel, kurd û tırk "dı nav hevda heliyane".

Özal dıgot "heke zımanê kurdan serbest bıbe ji, kurd wê disa tırki tercih bıkın. Zaten cihêxwaz ji dı belavok û weşanên xwe da zımanê tırki bı kar tinın".

Lı gor Çiller, "kurd û tırk bûne wek goşt û neynık".

Lı gor anketên rojnama Milliyetê, "pıraniya kurdan êdi kurdi qıse nakın".

Herwısa hın kes û dorhêlên "ronakbir" ji hene ku, bı navê "çepitiyê" û "pêşverûtiyê" beşdari vê propogandayê dıbın. Mesela yên ku çareserkırına pırsa kurda, dı avakırına "Yekitiya Federasyonên Rohılata Navin" da dıbinın, wek Doğu Perinçek, Mete Tuncay û hwd... Evana ji, bı rengên hıneki cuda pıştgıriya propoganda dewletê dıkın. Mesela ronakbirê tırk Mete Tuncay

dıbêje: "Eger nuha rojname, TV û radyoyên kurda hebın ji, kurd wê disa yên tırki tercih bıkın" (Azadi 14-20 Adar 1993, Kürt Realitesini Tanımanın gerekçeleri Sempozyumundan).

Evana derheqa têkiliyên cıvata tırk û kurd da tabloyeke wısa nişan dıdın ku mırov dıbêje qey êdi ferqa kurd û tırk nemaye. Lı gor propoganda wan, "pıraniya" kurdan dı nav cıvata tırk da heliyane û êdi bûne tırk. Bı vi awayi şansê azadiya kurdan û Kurdıstanê jı holê rabûye. Helbet ew bı propogandayên weha dıxwazın bêhêviti û sıstiyê têxıne nav Tevgera Azadiya Gelê Kurd.

## Du rûyên madalyonê

Wek me lı jorê ji diyar kır, siyaseta dewleta tırk dı 70 salên derbasbûyi da bı ser neket. Asimilekırına kurdan bı qasi ku dıjmın dıbêje pêşda neçû. Gelê kurd iro ji lı ser piyan e, û bı xurti jı bo azadiya xwe ber xwe dıde. Lê ev rûyeki madalyonê ye.

Dıvê em rûyê madalyonê ê dın ji bıbinın. Ma iro mırov dıkare fenomena asimilasyonê yekser bavêje pışt guhê xwe?.. Gelo ew şertên ku heta nuha zıman û çanda me dıdan xwedikırın, iro ji hene? Gelo Tevgera Netewi ya Kurd gıhiştiye wê pêngavê (derece), ku bıkarıbe rê lı ber xetera asimilasyonê bıgre, yan ji wê daxine ser pêngava heri nızım? Lı gor raya me, pêwist e lı ser vê pırsê bı awaki cıddi bê sekınandın.

Dewletê hela hê hêvi û gumana xwe jı siyaseta asimilasyonê nebırriye. Bêguman ew ji dızane ku mıletê kurd tenê bı kuştınê xılas nabe. Lê wısa xuya ye ku, bı saya terorê û valakırına Kurdıstanê, surgûnkırın û koçemalkırına kurdan hêvi dıke ku, wê jı vır şûnda bıkarıbe kurdan bı awayeki hêsatır asimile bıke. Loma ew iro bı rık û serhışki xwe jı naskırına mafên gelê kurd dûr dıgre. Ew qet bı riya aştiyê nêziki çareserkırına pırsê nabe.

Bêşık bı temami pêşilêgırtına asimilasyonê -wek gelek pırsên dın-bı rızgariya gelê kurd va gırêdayi ye. Lê heta wê çaxê û pıştı wê ji, ev pırsa han wê hebe. Belki tesira asimilasyonê, ziyan û texribata wê bı zemaneki pır dûr-dırêj berdewam bıke, û rakırına wê dıjwartır bıbe.


Çımki dewlet, bı awaki sistematik, lı gor plan û bernameyekê karê asimilasyonê dımeşine. Û mıxabın dı van salên dawin da, jı siyaseta asimilekırınê ra hın imkan û mecalên nû ji peydabûne. Dewlet bı bahana şerê çekdari lı Kurdıstanê teroreke nebinayi dıke. Heta nuha bı hezaran gund, gom û mezra vala kır û hina ji vala dıke. Demografi û nexşeya ciwarbûna kurdan bı lez dıguhure. Lı gor hın texminan, % 50 yani nivê nufûsê kurdan, Kurdıstan terk kıriye, û lı metropolên Tırkiyê belav bûye. Lı gor hın agahdariyan tenê jı par heta havina isal milyonek û niv (1.500.000) kurd jı axa bav û kalan derketıne û çûne roavayê Anatolyê. Eger em imkanên teknikê xasma ji TV lê lı ber çava bıgrın hıngê cıddiyeta problemê wê bêtır xuya bıke. Aha ev ji rûyê madalyonê ê dın e...

## Lı ser xetera asimilasiyonê

Bêguman tesbitkırına dereca asimilasyonê, bêtır bı lêkolinên zanısti, agahdariyên istatiki mumkun dıbe. Lê dı vê demê da xetera asimilasyonê rastiyeke ewqas vekıri û berbıçav e, ku herkes dıkare bıbine. Ew roj bı roj û bı awayeki ciddi hebûna xwe dıde hısandın, û ziyanên mezın dıgıhine rûmetên kultura netewi ya kurdan. Çımki gelek faktorên sereke yên ku heta nuha zıman û çanda kurdi dıdan xwedikırın, iro bı lez dıguhurın. Û xasma ji demografi... Bê nıqaş faktora heri negativ û mezın iro ev e.

Çawa tê zanin, kêmkırına nufûsê kurdan (bı riya valakırına Kurdıstanê, yan ji hın navçeyên wê) jı berê da xeyal û daxwaza TC ye. Bona vê gelek caran qanûnên surgûnê (Mecburi iskan kanunları 1927 û hwd.) derxıstiye û cerıbandiye. Lê heta van salên dawin, nıkaribûye kurdan bı awaki gırsi jı erd û warên wan dûr bıxe. Mıxabın dı van çend salên dawin da qısmen gıhişte daxwaza xwe. Dıgel guhartına demografiya kurdan, iro tehditeke dın a heri mezın ji TV' ên tırki ne. Bı saya wan çerxa asimilasyonê geleki bı lez dızıvıre.

Eger em gotına xwe kurt û vekıri bıbêjın,



**Nuha bı milyonan kurd jı ber zulma dıjmın,Kurdıstan terk kırıne. Pıraniya wan lı metropolên Tırkiyê wek İstenbol, Enqere, İzmir, Edene û hwd. bı cih bûne... Lê gelo ev çare ye jı bo dewletê?**

gelek tıştên ku dı nav 70 sali da pêknehatıne, dıkarın dı nav 15-20 salan da pêkbên. Bıla dı vê yekê da qet şıka me tunebe.

Derbari xetera asimilasyonê da, keseke biyani, nıviskara alman Petra Wurzel, dı hevpeyvinekê da bala welatparêz û ronakbirên kurd dıkşine û bı kurti weha dıbêje:

*"Pêşketına siyaseta asimilasyonê bı awaki xeter lı Tırkiyê heye û rastiyeke xemdar e. Lê jı bo ku mırov bıkarıbe zora asimilasyonê bıbe, û dı warê zıman da bıbe welatparêz, dıvê dı etaba pêşin da ev rastiya han bê qebûlkırın."*(Azadi, hejmar 83. Çıleyê Pêşin 1993)

Disa sosyolog û nıviskarê tırk İsmail Beşikçi ji dı vi wari da carına kêmasiyên kurdan dınıvise û gazınan dıke. Ew bala wan dıkışine ser gırıngiya zıman û sazgehên netewi yên kulturi. Lı gor wi şuûra milletiyê û rûmeta zıman dı nav kurdan da kêm e.

Lê kurd bı xwe, dı nav xwe da çıqas vê pırsê nıqaş dıkın? Lı gor raya me ne geleki. Jı asimilasyonê, jı dızina çanda kurdan, jı rewşa zımanê kurdi gelek caran gazın tên kırın. Lê, lı dıji vê rewşê, bıli hın xebatên bı hudûd û parçe-parçe, dı çapa netewi da xebatên berfıreh û bı tesir hina xuya nakın. Helbet sedemên vê yên gırıng hene. Xên jı zordestiya dewletê ya hışk, sedemeki dın yê muhim ji ew e ku, dı nav tevgera azadiyê da, hın hêzên siyasi, bı salan xebatên dı vi wari da pêwist nedıdıtın. Hetta hınan ji bı çaveki nızım lê mêze dıkırın. Yên ku pêwistiya xebatên çandi dıanin zıman û rê nişan dıdan, ew ji bı "reformistiyê", yan ji "nasyonalistiya burjuva pıçûk" dıhatın itham kırın. Beşek jı şoreşgerên kurd, dı bın tesira çepên tırk da, û lı ser navê enternasyonalistiyê, xeberdana kurdi ji lı xwe qedexe dıkırın.

Lê qet nebe jı nuha şûnda ji, bı şuûr û tevgereke xurtır mudaxale mumkun e û şert e. Dıvê êdi herkes bıbine û têbıgıhije ku têkoşina çandi (kulturi), parçeyeki Têkoşina Rızgariya Netewi ye û gırıng e. Lı gor raya me, ihmalkırına wê, dıkare jı ziyanên hin mezıntır ra rê vebıke.

Herwısa dıvê tevgera welatparêz gavan bı hısab bavêje, lı dıji valakırına Kurdıstanê tevdirên lazım bıstine. Mılleteki ku jı cografya xwe dûr bıkeve, dıkare hebûna xwe ya milli ji, zıman û çanda xwe ji wında

bıke. Dewleta tırk bı valakırına Kurdıstanê dıxwaze xwe yekser jı pırsa kurdi safi bıke. Û Tıştê ku iro lı Kurdıstana Bakur dıqewıme jenosid e, tunekırına mılleteki ye. Dıvê welatparêzên kurd bala raya gıştî ya dınyayê bıkşinın ser vê qetliamê. Gereke ev bûyer rojekê zûtır bıkeve rojeva Milletên Yekbûyi (FN)

## Şertên Kurdıstanê ne wek yên Cezayir û İrlandayê ne

Bêşık, wek me pêşda ji gotıbû, bı temami pêşilêgırtına asimilasyonê, pêşdabırına zıman û çanda kurdi ji -wek gelek pırsên dın- bı rızgariya gelê kurd va gırêdayi ye. Û tıştekî xuya ye ev pırs ji bı balansa hêzê va gırêdayi ye. Lê dı dirokê da nımûne hene ku nişan dıdın eger dı nav geleki bındest da, pêvajoya zımanguhastınê carekê dest pê kırıbe, yan ji wi geli êdi zımanê xwe terk kırıbe, pıştî merheleyekê, dı hêza siyasi û legal da ji balans lı dıji wi geli xerab dıbe. Komara İrlanda'yê nımûneyeke balkêş e. Ingiliza wek grûbeke elit, dı sedsala 16'an da İrlanda xıstın bın destê xwe. Bı hejmar ingiliz dı destpêkê da geleki hındık bûn. Wexta İrlanda dı sala 1921'an da rızgar bû, bû dewleteke otonom, pêvajoya zımanguhastınê ewqas pır pêşta çûbû ku, êdi tu tevdir û çareyên dewleta İrlandi nıkarıbû asimilasyonê bıdın sekınandın. Ango bı hemû imkanên xwe dewletê ji kır û nekır nıkarıbû rê lı ber asimilasyonê bıgre. İro % 80 gelê İrlandayê zımanê ingilizi qıse dıkın. Ku xelkê İrlandayê bı temami nebûne ingiliz, ev ji bêtır bı pırsa din va gırêdayi ye. Jı ber ku gelê irlandi bı pırani katolik ın, ingiliz ji protestan ın.

Disa lı hember vê ditınê, gelek caran nımûna Cezayir-Fransa tê nişandan. Lê lı vêderê ji rola faktora din (İslam-Xırıstiyan), û pırbûna welatên ereban û şertên dın lı ber çavan nayê gırtın.

Helbet mırov dıkare jı gelek derên dınyayê nımûneyan bınıhêre û bı wi awayi lı ser rewşa zımanê kurdi spekulasiyonan bıke. Lê tıştekî geleki eşkere ye ku lı tu derê dınyayê, siyaseteke asimilasyonê wek ya Tırkiyê dıjwar û xedar nine. Dezavantajeke dın ji ew e ku pıraniya kurdan wek tırkan musluman ın. Dewlet, kengê lazım be faktora din bı hostati lı dıji azadixwaziya gelê kurd bı kar tine.


## Çend tevdir

Pêwist e ku ronakbir, rêxıstın û sazgehên Kurdan, hûrgılî lı ser pırsa asimilasyonê bıfıkırın, analizên rast bıkın û lı gor wê ji hın çare û tevdiran bıstinın. Dıvê ew bı xebat û tevdirên ku iro hene qima xwe neynın; lı imkan û çareyên nû bıgerın, yên heyi berfıretır bıkın.

Lı gor raya me, dı warê parastına û pêşdabırına zıman û çanda kurdi da, lı ber Tevgera Welatparêz gelek kar û wezifên berbıçav hene, dıvê ew bêne ci. Hın jı wan karan mırov dıkare bı kurti weha rêz bıke:

a- Kampanya jı bo qısekırın û xebıtandına zımanê kurdi, dı hemû warên jiyanê da.
b- Pıştgıri yan ji pêşengi jı bo avakırına sazgehên netewi wek enstitu û akedemiyên zıman û dirokê (Yên serbıxwe, ku bı hêzeke sıyasi va gırêdayi nebın)
c- Pıştgıri yan ji pêşengi jı bo pêkanina medyayên gırıng wek radyo û TV'ên kurdi
d- Bı riya weşanên cuda û vekırına qursên zıman teşwiqkırın, belavkırın û pêşdabırına xwendın û nıvisandına zıman dı nav gel da.
e- Peydakırına alikariya navnetewi jı bo parastına zıman û çanda kurdi. (Mesela jı UNESCO).
f- Berhevkırın û parastına edebiyata devki (folklor).
g- Pıştgıri û teşwiqkırına nıviskar û hunermendên kurd.

Ev hın tevdir û xızmetên konkret ın, ku wê bıkarıbın dı pêvajoya şerê rızgariyê da raste-rast lı zıman û çanda kurdi tesirên baş bıkın. Xebatên weha moral û şuûra netewi bılındtır dıkın. Û bêşık bılındbûna şuûra netewi dı eyni wextê da xurtbûna şerê rızgariyê ye.



# Ahmed Arif:



## *"Mın jı çı afatê hez kır! Serda jı dev heye, zıman tune Kela Diyarbekır..."*

A. GERNAS

**Ahmed Arif** wek hozanê mêrxasiyê tê bı nav kırın. Rast e, lewra ramanên serê wi zelal ın, çiptazi ne. Bı rext û fişekan gırêdayi, amade ne jı şer ra, jı qeda û belayê ra. Bı xiret ın, bı evin ın, bı hêvi ne.

Şev xayin be jı, can xerib û bêdeng , can parçe parçe be jı û dest dı kelemçê da bê xew û bê tıtûn bımine jı, terka evina xwe nake, jê hez dıke her dem. Mebesta wi hêj dı destpêkê da kıfş e, meydan dıxweyne rû bı rû, raste rast. Ramanên serê wi zelal ın, benê xwe qetandıne jı qeyd û leleyan. Heval ın, dostê bı şewat ın bê xapandın. Dostê gelê Kurd , insanên belengaz, karger, gundi. Dıbe şırikê derd û belayên wan, dıkşine xencera xwe jı kalan û êriş dıbe ser dıjmınên wan.

Tu dıbini ku, "pivazê şin" ketıye rengeki û jiyanê jı nû va vedıjenine, dıbe mızgina bıhara

welat, dıbe sembola evinên heri bedew. Dıbini ku, peyva "veşarteka pûşt" ketıye ser zar û zımanê te lı dıj xayinti, dafık, pûşti û durûti. Namûs dıbe hêvi, dıbe baweri dı dıl da.

Nışkava dıxwazi çayek vexwi, dema wê jı berfê. Pıştre dıxwazi "Loriya Adiloş" bıdi ber singa xwe, bı şirê xwe mezın bıki lı hember "marên gewr", bênamûs û kedxwaran. Jı Kela Diyarbekır hez bıki, guhdari neki fermanan, bıparêzi jı hemû belayan. Lı "hespê seglawi" sıwar bi û berê xwe bıdi çiyayan, çiyayên qedırnas, çiyayên ku bı hezar salan te dı paşıla xwe da veşartiye û parastıye jı oxırmê gıran.

Belê Ahmed Arif şaırê tırsnenas e, ger çıqas negotıbe ez Kurd ım ji, yan ji nedabın gotın!. Naveroka pıraniya şıêrên wi Kurd ın, Kurdıstan e her çıqas bı nav nekırıbe ji, yan ji nedabın bı nav kırın!. Dertê ser zınareki bılınd, wek zanyareki tarixê hezar salan dıde dû xwe û Kurdıstana diroki ya qedim destnişan dıke, tıxûban dıkşine.

*"Ev çiya çiyayê Mengenê ye*
*Gava berbang davêje lı Wanê*
*Ev çiya têjıkê Nemrûd e*
*Gava berbang davêje lı hember Nemrûdê*
*Aliki te şepe dıgre, asoya Qafqas e*
*Aliki te seccade mılkê Ecem e"*

Bı pırtûkeke bıçûk, tenê bı pırtûkeke bıçûk belav dıke nav û dengê xwe, sinoran dıçırine û dıgıhê ser textê zêrin ê şaıriyê. Mêrxasiya gelê Kurd dıxe pırtûkan, êş û rencên wan dırêje ser rûpelan bı hubra reş. Bı gotınên mêrxas, tırsnenas...

*" Lê çı bêjım.*
*Xırabtır, bûye qısmetê me.*
*Mırın, bı vi awayi şeşderb lı merıv naxe,*
*Dengnekırın û sekın, gelek dıjwar e*
*Cıwan ın em, wek lûla tıvıngê,*
*Û dılê çetel,*
*Jı aşıtiyê ra, jı cejnê ra hesret*
*Jı xewan ra, kûr, bêxem, rehet,*
*Bı sih û du dıranan jı kenê ra,*
*Jı hezkırına têri xwe ra, jı xwarınê ra...*
*Çend car, kelegırini bûme bı şevan,*
*Ya rasti, hesret dı navbera me da xweş e*
*Û dı eslê xwe da, em dızanın kesrandınê. "*

Dı şıêrên Ahmed Arif da peyv, hevok gelek kurt ın lê her peyvek çiyayek radıgıre ser pışta xwe, kûrmane ne, pırmane ne. Dı bınê wan peyvên gelêri da felsefeyek kûr heye, lê qasi ku kûr e ewqas ji vekırıye wek ronahiya hivê. Hênık dıke dılê cehnıme, vedıjenine hêviyê û bı mêrxasi pê dıkute erdê jı bo azadi. Qeyd û leleyan kevın dıke bı vê hesretê.

## *Mın jı hesreta te qeyd û leleyan kevın kır*

*Te, bıkarıbım behsa te bıkım*
*Jı zarokên baş ra, jı qehremanan ra.*
*Te, bıkarıbım behsa te bıkım*
*Jı bênamûsan ra, jı kesên halnenas ra,*
*Jı derewa qehpe ra.*

*Lı dû hev çend zemheri*
*Gur radıza, çûk radıza, zindan radıza*
*Lı derva dınyayek ku bı gure gur dıherıke...*
*Tenê ez ranezam,*
*Çend bıharên leylım,*
*Mın jı hesreta te qeyd û leleyan kevın kır .*
*Gulên xwinê bı porê te va deynım*
*Yek lı vi ali*
*Yek lı wi ali...*

*Te, karıbım te bıqirım*
*Jı birên bêbıni ra,*
*Jı stêrkên şemetek ra,*
*Heta dendıkeki nıftıkê,*
*Jı pêla derya ya heri averê ra*
*Jı dendıkeki keti yê nıftıkê ra.*

*Sêra xwe wında kırıye hezkırınên te yên pêşi,*
*Wında kırıye ramûsanan,*
*Para wi tune, jı êvara bê wext,*
*İskanek, cıxareyek, heta jı xwe va dıçın*
*Te, bıkarıbım behsa te bıkım...*
*Kêmaniya te, bo cehnımê naveki dın e*
*Bı mın sar e, negre çavên xwe...*

Zımanê şıêrên wi Tırki ye lê naverok Kurdi ye, serapê Kurdi ye... Û bı taybeti ji, jı ber vê pênasê, pênasa Kurditi hevs û zindan, qeyd û

lele bûne parçeyek jı jiyana wi. Bûye gur dı çavê dewleta Tırk a dagırker da.

Gelek caran bûye meraq û hatıye pırsin, "gelo Ahmed Arif gotıye, ez Kurd ım?" Bı rasti mın ji nebıhistıye, lê "pêwistiyeke weha" nebûye asteng lı pêşiya pênasa Ahmed Arif. Şıêrên wi, hestên wi, armanc û têkoşina wi ya bê taviz têri xwe delil ın, hewceyi isbatê ninın.

"Ez hozaneki gelê xwe yê belengaz û bındest ım. Ev jı bo mın şanaziyeke payebılınd e" dıbêje Ahmed Arif û dı hevpeyvineki da ji weha tine zıman pevgırêdana xwe û gelê xwe: "... Ez, kurê xelkeki bêdeng û kûr ım. Û ne tenê bêdengi, bı gelemperi bêtırsi ji xusûsiyeteke gelê mın a sereke ye. Dıvê merıv xusûsiyeta berxwedan û serhıldanê ji lê zêde ke..." û herweha dı her fersendi da bı reheke qalınd xwe bı gelê xwe va gırê dıde, jiyana gel jı xwe ra dıke çavkaniya heri mezın û vê pevgırêdanê dıke şanazi bo xwe.

## *Şanazi ji dıgri*

*Dı kaniyê çavên te da,*
*Ewrek,*
*Lı ber valabûnê ye*
*Hema hema.*
*Tıştên ku jı hışê mın derbas dıbın*
*Dıxweyni wek av.*
*Dınya dit,*
*Dest kırın qırıka me...*

*Negre fırmêskên xwe*
*Şanazi ji dıgri...*
*Berde bıra xwe bışo esman*
*Laciwert, kesk, zêr*
*Tirêjên roja ku dıçe ava.*
*Vaye lı berbangê ne disa*
*Çiptazi*
*Û şin.*
*Vaye dıbêji qey sıra çiya*
*Û dıbêji qey bayê nerm ê derya...*

*Kes nıkare tozê deyne*
*Ser neynoka me ya ku dıbrın û davêjın*
*Tu keça heri bedew i*
*A hemû galaksiyan.*
*Ez ji cewhera wê me êdi*
*Cewhera wê ya soragır ım,*
*Evina reş*
*Ya ku Prometheus dısotine...*
*Ne dı eniya me da eybek*
*Ne dı bın çengan da*
*Xaça me ya veşarti.*
*Me jı vi xelki hez kır*
*Û jı vi welati,*
*Her ev e yê ku nayê efûkırın*
*gunehê me yê tırsehêz...*

Ahmed Arif lı ser axeke kevın, lı Dıyarbekır hatıye dınê. Axeke ku dirokek kevın û çandeke mezın dı paşıla xwe da veşartıye û gıhandıye me. Bı zagonên eşiri, mêrxasi û dobra dobri mezın bûye. Xayinti, pûştiti biyani ne jı pênasa wi ra. Eger wi carek sozê mêra dabe, veger, poşmani tune jı wi sozi.

## *Destnıvisara Kela Diyarbekır û Loriya Adiloş*

*1.*
*Destê mın naçe*
*Bihokên wê, hınarên wê yên dıl dıbıji*
*Stûyê xwe xwar dıkım û dımeşım.*
*Ev ne ew hal e ku gur û teyr pê bızanın*
*Qet pırs neke*
*Laaaaaaal...*
*Jê vegere bıra fermana reş derê rêyan*
*Baxçê yarê tarûmar*
*Xwin der dıke perçem*

*Here were lepeki can,*
*Pêşkêş kıriye mın, jı qeda û bela wê ra,*
*Ez bımrama loooo...*
*Destê mın vala,*
*Piyê mın gırti.*
*Û yê ku bızanıbe tenê ez ım*
*Mın jı çı afat hez kır!*
*Serda ji dev heye zıman tune*

*Kela Diyarbekır...*

*2.*
*Vedıke,*
*Gulê çilsor ên heftber*
*Û jı aliki va berf dıbare,*
*Ba dıbe Qerecdax,*
*Ba dıbe zozan...*
*Bınıhêre, sımbêlê mın qeşa gırt,*
*Lı mın sar e ji*
*Zemheri ji ajot û ajot,*
*Te, wek ku bıhar dıfıkırım,*
*Te, wek Diyarbekır,*
*Bı ser çı, bı ser çı nakeve ku*
*Tama ramandına te...*

*3.*
*Ava Xamrawat qeşa gırt,*
*Lı ser Dicleyê çar tıli qeşa,*
*Em derdanên xwe jı birê dadıgırın,*
*Jı berfê dema çayê dıgrın.*
*Diya mın wek sır vedışêre êşa xwe*
*"Ba ye" dıbê, "bıharê tıştek mın namine".*
*Xwişka mın, ducani, gıran,*
*Ya ewıl e, jı aliki va bı dızi şerm dıke*
*Û jı aliki va ji dıtırse*
*Bı xofa mırınê*
*Vê zıvıstanê canek dın ji lı me zêde dıbe,*
*Pêçeka mın, ez dı ku derê xwe da bıparêzım?*
*Bı xêr bê,*
*Bı xweşi bê,*
*Xwarziyê Ahmed Arıf...*

*4.*
*Tu hati dınê*
*Sê roj me te bırçi hişt*
*Sê roj pêsir neda devê te*
*Pêçeka mın Adiloş.*
*Jı bo ku tu nexweş nekevi*
*Jı ber ku toreyên me weha ye,*
*Êrişê pêsirê bıke nıha*
*Êriş bıke û mezın bıbe...*

*Vana,*
*Marê gewr û zivzive ne*
*Vana,*
*Çav berdane*
*Xureka me, nanê me,*
*Vana nas bıke*
*Nas bıke û mezın bıbe*
*Ev, namûs e,*
*Lı navdanka me kolandi,*
*Ev ji sebır,*
*Jı jehriyan werıvandi*
*Xwe lı vana bıpêçe*
*Bıpêçe û mezın bıbe.*

## Ahmed Arif
(1927 - 1991)

Navê şaırê mezın ê esli Ahmed Önal e. Lê ew wek paşnav, navê bavê xwe ango navê Arif (Arif Hikmet) bı kar aniye û herweha bûye Ahmed Arif. Bavê wi mudurê nehiyê bûye û wekiltiya qeymeqam kırıye. Navê diya wi ji, Sarê ye.

Dı sala 1927'an da lı Diyarbekır hatıye dınê. Pıştre mala wan dıçe Sıwêrekê û pengava pêşin a dıbıstanê lı wê derê kuta dıke. Pengava navin lı Ruhayê û lise ji lı Afyonê temam dıke. Lı Ankarayê, lı Fakulteya Zıman-Tarix-Cografya xwendına xwe ya bılınd dıdomine û jı beşa Felsefa diploma werdıgıre.

Helbestên wi cara pêşin dı sala 1948'an da dı hın kovaran da tê weşandın. Jı ber ditın û ramanên wi yên siyasi, dı navbera salên 1950 - 53'an da du cara tê gırtın.

Wi du diyalektên Kurdi, Kurmanci û Zazaki zanıbû. Helbestên xwe bı zımanê Tırki nıvisiye. Helbestên wi wek pırtûk dı 1968'an da bı navê "Mın jı hesreta te qeyd û leleyan Kevın kır" hatıye weşandın û heta nıha seriya sih (30) caran jı nû va hatıye çapkırın. Gelek helbestên wi yên neçapkıri ji hene.

# Çend gotınên bıjarte...

Tenê çûkên kedi bı hesret ın. Yên bıyani dıfırın.
*ELMER DIKTONIUS*

Tu tıştekî bêimkan tune jı bo keseki ku bı xwe ne mecbûr e tıştekî bıke.
*EARL WILSON*

Xweşi û serfırazi! Wey! ma jı wê hêsatır çı heye... Tenê sıheteke baş û havızayeke xırab bes e.
*ERNEST HEMINGWAY*

Tıştê heri delal dı jiyanê da, illizyonên (xeyal) derheq jiyanê ne.
*HONORÉ DE BALZAC*

Dema kesek ku lı xwe rexne bıke, kesên dın jê bawer dıkın, lê tu wextê kes jê bawer nake eger bı xwe pesnê xwe bıde.
*MICHEL DE MONTAIGNE*

Em şaşiyên xwe yên pıçûk qebûl dıkın, jı boy ku em bıdın bawerkırın ku şaşiyên me yên mezın tunene.
*FRANÇOISE DE LA ROCHE-FOUCAULD*

Xırabiya heri mezın ya ku dê û bav bıkarıbın bı zarokên xwe ra bıkın ew e ku, ew bı xwe zarotiya xwe jı bira bıkın.
*AKSEL SANDEMOSE*

Kêyfa dubare ew e ku sextekarek sextekareki dın dıxapine.
*JEAN DE LA FANTONE*

Mırov dıkare keseki durust bıxapine, lê mırov nıkare wi bıke pêkenokê xelkê.
*KONFUÇYÛS*

Zeman mamosteyeki mezın e, lê mıxabın hemû şagırtên xwe dıkuje.
*HECTOR BERLOIZ*

Din (ol) ew e ku nahêle feqir dewlımendan bıkujın.
*NAPOLYON*

Kengê mırov dê û bavê xwe efû bıke hıngê mırov êdi gıhişti ye.
*JEAN-JACQUES ROUSSEAU*

---

*Amadekar: Xalıt LEZGİN*

# Fabl



**Azad Nûbar**

Fabl çirokên kurt ın, û pıri caran lı ser heywanan tên gotın. Dı wan da heywan qıse dıkın. Ew dı eslê xwe da dıxwazın lı ser pêwendiyên mırovan û derheq kêmasiyên mırovan da fıkrên rast û exlaqi yên baş pêşda binın. Lı dıji gevezetiyê, qureti û pozbılındiyê, dexesi û çavnebariyê, derew û durûtiyê derdıkevın. Dı dawiya fablan da şiret yan ji ramaneke esasi cih dıgre.

## Dı zargotınê da

Beri icata matbaayê û pêşketına hunera çapkırınê, hema hema hemû şêweyên zargotınê (edebiyata devki) bı awayê manzûm dıhatın gotın. Wek çirokên gelêri, çirokên ser heywanan, fabl, destan, stranên lirik, û hwd. Ev hemû ji wek helbestê bı qafiye bûn. Bı vi awayi ezberkırına wan ji, gotın û belavkırına wan ji hêsatır bû. Lê pıştı derketına matbaayê, dı edebiyata cihanê da guhartın û pêşketıneke mezın qewımi. Gelek jı şêweyên edebiyatê mesela wek destan, çirokên lawıran û fabl, jı fonksiyonên xwe yên esasi yan gelek tıştı wında kırın, yan ji formên xwe guhartın. Herwısa cara pêşin şaxên epikê yên nû peyda bûn, wek roman û hıkayetan (novel).

İro dı edebiyata nıviski da ji fablên manzûm hene, lê bı pırani ew wek nesir tên nıvisandın.

Dı edebiyata kurdi ya anonim da ji gelek fabl hene. Çawa tê zanin, Kurdıstan jı aliyê folklorê da zehf dewlemend e. Gelek misyoner û lêgerên Roavayê lı hember vê dewlemendiyê şaş û matel dımının. Gelek jı wan, vê zenginiya han, lı gor xwe bı sedemên cuda-cuda va gırêdıdın. Lı gor hın kesan, sedem, rewşa siyasi ya kurdan û bındestiya wan ya sedsalan e. Lı gor hınan ji cihê Kurdıstanê ye, ku lı ser riya ticaretê, çûn-hatınê bûye; û herwısa jı berê da lı Kurdıstanê gelek medeniyet avabûne, û paşê wında bûne. Loma kultura kurdan xwediyê miratê hemû wan medeniyetên kevn e... Axır sedem çı dıbe bıla bıbe, zargotıneke me ya dewlemend heye. Eger em rûmeta wê bızanıbın û bıkarıbın rojekê zûtır jı ber çerxa asimilasyonê xılas bıkın.. Hıngê em ê bıkarıbın jê sûdê wergırın. Bı rasti ji edebiyateke fıre û nûjen (modern) dıkare lı ser bê avakırın.

## Dı edebiyata nıviski da

Wek hemû şêweyên zargotınê, hosta yan ji afrandarên fablan ji nenas ın.



*Dı dewra Aisopos da, dıbıstanên wek yên nuha tunebûn. Zarokên dewlemendan lı cem dersdarên arızi dıxwendın. Ew dersdar ji pıri caran kole bûn. Lı jorê dersdareki kole, çoyê wi ji lı kêlekê hazır, rûnıştiye û dersê dıde.*

Kes nızane kê pêşiyê ew gotıne. Lê lı gor literatûra Roavayê -ku ew ji çavkani û iddiayên diroka antik ya Yûnaniyan esas dıgrın- cara pêşin bı navê **Aisopos** mıroveki bı aqıl hebûye û wi gelek fabl afrandıne. Derheq Aisopos da bıli texminan, hema hema tu agahdariyeke esse tune. Lê tê gotın ku ew 500 sal BZ (Beri zayina İsa) lı dorava (ada) Samos jiyaye. Ev dorav dı Derya Spi da ye. Aisopos koleyek bûye. Mıroveki bejn-kurt, pıçtxûz, lê geleki zeki û jêhati bûye. Wısa nukteci, bı henek û laqırdi bûye ku, qral û miran û kesên xwedi kole ew hıldane nav xwe û pê wextê xweş derbas kırıne. Bı vi awayi Aisopos bûye mıroveki navdar û lı seranseri welêt hatiye naskırın.

Lê Aisopos dı çirok û henekên xwe da serê tirê ê tûj, tûşi keyser, û koledaran kıriye. Ser vê yekê dewletê cezayê mırınê daye wi û xenıqandiye.

Bı rasti Aisopos hebûye yan tunebûye ev esse nayê zanin. Lê dı edebiyata yûnani ya nıviski da, lı ser navê wi gelek fabl hene ku lı hemû cihanê ji tên naskırın.

İro dema fabl tê gotın dı seri da navê **La Fontaine** yê fransi tê bira mırov. Jı ber ku wi dı wextê da gelek fabl nıvisine û kıtêbekê da berhev kırıne.


Lı Fransayê, dı sala 1668'an da pısmireki pıçûk ê heftsali hebûye. La Fontaine jı bo vi lawê Qral kıtêbeke çirokan amade kıriye. Ev kıtêb tenê berhevoka fablan e. Pışti demekê ew bûye pırtûka dersê jı bo hemû zarokan. Ne tenê lı Fransayê, lı gelek welatên dın ji belav bûye..





*Berhevoka fablên La Fontaine*




*Mıletên dın jı zûda berhemên xwe yên folklorik, wek destan, çirok, çirokên lawıran, fabl û hwd. berhev kırıne. Kurdan ji êdi hêdi-hêdi dest pê kırıne wan berhev dıkın. Lı jorê em bergê pırtûkeke M. Emin Bozarslan a çirokên lawıran dıbinın.*





# WEŞANÊN NÛ




Hesenê Metê
LABİRENTA CINAN
(Novel-kurmanci),Weşanên
Welat Stockholm1994,

Katharine Scherman
WİLLİAM TELL
Werger: Ali Dicleı,
Weşanên Roja Nû,
Stokholm1993, 62 r.




Bûbê Eser
GARDİYAN (roman-
serpêhati, kurmanci), .
Weşanên Roja Nû, 1994,
Stockholm 165 r




Prof. İ. Farizov
FERHENG Tırki- Kurdi, 344 r.
Özge Yayınları, Ankara 1994




Haluk Öztürk
PEYVÊN ME -Heşinayi û
heywan, (Jı bo zarokên
dıbıstanê, qısmen rengin)
Weşanên Roja Nû, 1994





Mehmet Bayrak
Açık-Gizli, Resmi/Gayri resmi
KÜRDOLOJİ BELGELERİ,
Özge Yayınları, Ankara 1994




Mehmet Bayrak
KÜRTLER ve ULUSAL
DEMK. MÜCADELELERİ
Gizli Belgeler-Araştırmalar-
Notlar. 165 s. Özge Yayınları




Malmisanıj
CIZİRA BOTANLI
BEDIRHANİLER VE
BEDIRHANİ AİLESİ
DERNEGİNİN TUTANAKLARI
Weşanên APEC, Stockholm 1994.
322 r.




Bilge Acar
XORTÊ MIN JÎ YEK JI
WAN- (Lawin.)
Paris 1993, 210 r.




Edward Petişka
MİTOLOJİYÊN MEZOPO-
TAMYA, 88 r.
Werger jı bûlgari: Cemal
Batûn. İllustrasyon: Vanya
Lapardova- Batûn Weşanên
APEC, Stockholm1993




Mahmut Baksi
KÜRT GÖZÜYLE
YILMAZ GÜNEY
Weşanên Zêl, İstanbul
1994




Laleş Qaso
DARAN PEL DAN
(Diwan 1),
Weşanên PELDA
Stockholm 1993, 108




Hussên Hebeş
LI WIR LÊVÊN KEVI-
RAN ÇIK DIDIN (hel-
bestbı tipên latini),
Bonn 1994, 136 r.

Joyce Blau
KÜRTLER VE
KÜRDİSTAN- Eleştirisel
bir bibliografya-1977-
1990. Mezopotamia
Publishing, Sweden
1994, 166 r.





# Zıman û hinkırına zıman

*Vejêne zımanê xwe ey xwendevan,*
*Nebûye mılet hiç kesek bê zıman*

*Zımanê me xoş û xeroş û cıwan*
*Eger baş bızani tu naki zıyan*

*Tu kurmancıya xwe jı bira neki*
*Eger baş nızani dıwê zêdeki*

*Elifba û diwan û rıstan bıxwin*
*Heta ku weki mın nebi dıl bı xwin*


*Bınêre zımanê te çend dewlemend*
*Lı bajêr, tu carek xwe bıghêne gund*

*Bıbêne çı şêrin e evreng zıman*
*Çı payebılınd û çı rûmetgıran*
*...............*

*(Jı Zend-Avısta)*

**CİGERXWİN**


*WEŞANÊN ROJA NÛ*
*14 SALÊN XWE TIJÎ KIR*




Pırtûka yekemin ya Weşanên Roja Nû, "RONAK Diwana 4." ya mamosta Cigerxwin bû.